Sal 1 — Hejmar 30

Duşemb 6 Kanûna Pêşîn 1943

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

# ROJA NÛ

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edreşa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

CENG & SIYASET

## DEWRAN

DERBINE GIRAN Û DIJWAR

### Cengê Noqavan

Dengê serfiraziya noqavên elemanî êdî nayê. Emîraliya brîtanî bi isûlên xwe ên nû û bi xebata refên xwe a fidakar, di Behrên cihanê de zora wan biriye. Di nav 6 mehên dawîn de qiwetên brîtanî 150 noqavên elemanî binav kirine û pê 7.000 serbend û deryavan an hatin, e kuştin an di nav pêlên behran de fetisîne.

### Bombardimana Berlînê

Ev deh roj in refên brîtanî û emerîkanî bi şev û bi ro dirêjî hêjagehên elemana dikin. Erdê ko tê de ev êrîş çêdibin ecêb mezin e Di Behra Spî de hêjagehên Girîd, Rodos, Yewnanistan, Yugoslavya erdê Ernewûda û axa talyana, di Balqana de payetextê Bilxaristanê Sofye di bin derbên refên brîtanî û emerîkanî de xira dibin.

Li roavayê Ewripayê, febrîqe, destgeh, karxane û balafirgehên Frense, Belçîke û Holendayê bê etlahî têne bombardiman kirin.

### Heçî Axa Germanistanê

Ji bona elemana qey bihinistandin û çav-vekirin heram bûye. Di nav panzde rojên dawîn de refên brîtanî 13,000 ton bombe avêtine Berlînê. Bajarên elemanî ên mayîn mîna Bremen, Manhayim û Ludwigshafen jî ne hatine ji bîra kirin. Her yekî ji wan di nav heftekê de 1.000 û heta 2.000 ton bombe xwarine. Êrîşên Berlînê ên dawîn de, her şev hezar balafirên brîtanî dirêjî payetextê Reyxê dikirin û 2 û heta 3.000 ton bombe berdidan.

### Eniya Talyanî

Qiwetine teze ji nû ve hatine Italya nîroyî û ordiya Brîtanî 8 û a Emerîkanî 5 zor didin riyên Romayê, her çend jî nexweşiya hewayî dom dike û dinya berf û baran, û herî ye.

### Cengê Japona

Di welatê Rohelatê Dûr û di Pesîfîka Nîro-Roavayî de Hevalbendan di şerên behir û hewayî de gelek serdest bûne. Heta îro noqavên emerîkanî 505 waporên Japona bin av kirine. Ji destpêka şerî û heta niha qiwetên hevalbendan 1.432 waporên japonî xeriqandine.

### Ordiya Sor

Piştî ko di Propoiskê de leşkerên elemana hatine şkênandin, niho geliltangên rûsî ên gelek bilez, dane pey elemana û wan paş ve dajon. Propoisk ji bona elemana kelate ke mezin bû, lê di pêşiya zora yekîneyên rûsî de serdariya elemanî dev ji vê asêgehê berda. Niho Ordiya Sor di dirêjahiya 160 kilometran de, ber bi avraz û pengavên Pripetê ve pêş ve diçe. Xetên elemana yên zivistanî hatine şkênandin û qiwetên rûsî ên mezin yên ko Gomel standine, êdî serbest in û dikarin bidin pey qiwetên elemanî yên ko li ser riya Varsovayê — payetextê Polonyayê — xwe bi şûnda dikişînin. Serfiraziya Ordiya Sor a dawîn gelek hêja ye, ji ber ko eleman niho di erdeke rast de xwe bi şûnda dikişînin û her wekî dinya gelek sar e û erd qerisiye, ew nikarin ji xwe re çeper û penaha bikolin û têde xwe veşerîn û bervaniya xwe bikin. Ev du sal in eleman xetên ko niho hatine şkênandin asê dikirin, lê di pêşiya Ordiya Sor de ev xetên he hilweşiyane.

Ji aliyê din serdariya elemanî duhî di danezana xwe de mukir dihat ko êrîşa elemanî sekiniye. Ordiya Sor niho ji Zlobinê bitenê 15 mîl dûr e, rêhesina Lenîngrad Odesayê.

### Bi Vegertina Gomelê

Cengê axa Rûsya Gewir ketiye dewra xwe a birinî. Nûçeyên Moskovayê elam didin ko bîst perçe welatên Rûsya Gewir ji destê dijmina hatine azad kirin. Niho Ordiya Sor di Rûsya Gewir de zor dide şeş asêgehên elemana ên xurt: Mogilev, Bobruîsk, Rogaşev Zlovin, Kalînkovîşî û Mozîr.

Eleman bi xwe mukir tên ko rewişa eskerî di Mozîrê de bêhêvî û niyaz e. Ji aliyê din Ûrisa bajarê Bugakoşelevskayayê vegirtine, yê ko li ser rêhesina Gomel—Bobruîskê de ye, û pê yekîneyên rûsî 45 kilometran pêş ve çûne. Di Pripet û Berezino jêrîn de zehf gund û ovahîgehên din jî ketine destê Ordiya Sor.

### Di axa Kievê de

Hemî êrîşên elemanî hatine paş ve zivirandin. Di enîşka Dnieprê de Ûrisa Aleksandrovska standine, bajarê ko 54 kilomêtir bakurê Nikopo tê de ye. Di Korostenê de şerekî zor dom dike.

### Pêşekarêkî Elemanî

Ê eskerî duhî êvarê di Radyoa Berlînê de qala şerê axa Sovyetistanê dikir û digot: Ûrisa di bakurê Qrimê de bi qiwetine mezin êrîşî çeper û asêgehên me kirine; û li hin deran xetên me şkênandine, lê beriya ko bên pêşiya çeper kora me a bingehîn hatine sekinandin. Lêbelê wilo dixuye ko Ûrisa ji nû ve di Qrimê de, bi qesda derêxistina me jî vê erdê dest bi êrîşan bikin.

## NOT BALAFIRHILGIR

### Stola Emerîkanî Hin Bi Hin Xurtir Dibe

Nû—York— Di nav yanzde mehên vê salê de destgehên emerîkanî 40 waporên balafirhilgir çêkirine û di nav pênc mehên ko pêşiya me de ne 50 balafirhilgirên din wê bikevin behrê.

CEZAYIR — General Montgomerî emirnama jêrîn şiyandiye leşkerên Ordiya heştemîn: Hevalbenda erdê Italyayê zebt kirine, lê hêj eleman di pêşiya Romayê de pê didin erdê. Niho wext hatiye û divê emê elemana bavêjin heta bekurê payetextê talyanî, Eskerin ji yên elemana çêtir zora wan birine. Ew ketine halê ko me dixwest wan têde bibînin. Niho emê derbeke dijwar bidin wan; xwedê arîkarê we be, pêş ve bimeşin.

## GOMEL KETIYE

### Ordiya Sor Di Axa Rûsya Gewir De

Moskû— Piştî vegirtina Gomelê Ordiya Sor ber bi Minskê ve bi lez pêş ve diçe.

CEZAYIR — Li 26-ê mehê nêçîrvanên frensiz, di sêr behra Spî re dirêjî refeke elemanî a mezin ji bombeavêjan bihevketî kirine, û çar bombeavejên alemanî anîne xwar û xesarine dijwar gihandine pênc hebên din.

QAHIRE — Radyoa Qahirê dide zanîn ko li Rumanyayê di nav heft rojan de bi tometa ko zimandirêjiya Hukûmeta Antoneskoyê kirine 3.000 peya hatine danîn ber. tifinga.

## BOMBARDIMANÊN XURT

### 6 HEZAR TON BOMBE DI NAV 8 ROJAN DE

Londre— Di nav 8 rojên dawîn de refên brîtanî 6.000 ton bombeyên şewat û tekandinê avêtine Berlînê. Mareşal Haris, serdarê qiwetên brîtanî ê hewayî yên bombeavêjan ev tişt bi awakî resmî elam daye.

LONDRE — Mîna rojên duşemb, sêşemb û çarşembê, duhî jî radyoyên elemanî weşînekên xwe zehf caran sekinandine.

CEZAYIR — Komîta frensizî a xelasiya welêt îro çivanek danî.

## BALAFIRHILGIRA EMERIKANI

### Xesarine Dijwar Gihandine Qiwetên Japon

WEŞINGTON — Balafirhilgira emerîkanî ya ko arîkariya şerên girawa Gilbertê dikir 34 nêçîrvan û 12 bombeavêjên japonî anîne xwar.

Çung-King — Di şerê bajarê Sangtehê de 5000 kuştiyên japonî li erdê mane,

NÛ-YORK — Giravên jilbertê bi timamî ketine destê qiwetên emerîkanî; piştî çar rojên şerî zora japona bi timamî hatiye birin.

LONDRE — Duhî bi ro bombeavejên emerîkanî, kelehên fîrok ji nû ve dirêjî Sofiyayê û hêjagehên rêhesin û yên erd û payetextê Bilxaristanê kirine û xesarine dijwar gihandine armancan. Ev cara diwemîn e ko Sofiye tête bambardiman kirin.

MELBURN — Qiwetên ewistralî di Nû-gîneyê de li bakurê Satelbergê zehf bilindaliyine hêja standine.

## Qewil û Ayîn

### Qewilê Şêx Şahbedîn

Hay felekê, sed car hawar felekê,
Hawar dikim tu dey nakî
Hay felekê, sed car felekê.
Ehlê romê li hev civiyane
Xwendin fermana seyidane.
Dayika Şêxa tu bilezîne
Xurca zêra bi xwe r' hilîne
Her Stembolê li têla xîne;
Têla li ser têla tu bişîne,
Hedîkê ji waliyê re bişîne;
Belkî hefwa mala Xewis bînê;
Van seyida ne-şeniqîne.
Ez çûm Bedlîsê gelî bi gelî
Jê derxistin cotik welî
Girtin şex Şahbedîd Seyid Helî.
Dara xaziyê di devê rê da,
Şêx Şabedîn seyid Helî
Avêt bi darê de.
Şerît qetiya ji alî Xwedê de
Xîret ne ma di Îslamê de,
Hey felekê, sed car felekê.

### QEWILÊ SEFERBERLIKÊ

Hay hoy li min hewarê
Seferekê li me rabû
Çi seferekê giran e
Kesekî ev sefer ne dî
Jiçaxa Heliyê Heyinder de.
Hay hoy li min hewarê
Gola xwênê kûr e
Nade qamê..
Xwîn ji kurê bava dikişin
Nala çem û kaniya
Birîndara hewar dikir
Hekîm bînin dermana.
Dermanê van brîndara
Xaliq rebê rehman e.
Birîndara hewar dikir
Textor bînin dermanan
Bi çeplê van kurika digirtin
Avêtin xestexana;
Ev textor xain derketin
Jar xistin di nav dermana;
Heyfa van xorta
Di xestexana zelûl mana
Destê van kuran
ji dê û bava qetiyana;
Simbêlê sor û zer
Di bin axê de riziyana;
Dilekî min hevdalê
Behra tenik e
Ehmed Mixtar paşa
Girêda gemî, qeyike
Siltan Mihemed Reşad
Qeland toximê lawikan
Sultan Ebdil Hemîd
Te her xortekî difirot
Da bi bertîl û rişweta.
Ez diçûm Wêran Şa'rê
Bi kevirê reş e
Te li Kurdistan kiri bû
Çekê reş e.
Kurdistan xeşîm e, bi t'alîma
Boriyê nizane;
Ez çûm Wêran Şa'rê bi qar
û qiş e
Heskerê Mihemed Reşad
Li bextê te ma êrîşe;
Te li deşta Hewran
gawir kir du tiş e.

### CIVANÊ RUZWELT—ÇORCIL—ÇANGKEYÇEK

QAHIRE — Bi awakî resmî didîn zanîn ko Serekcimhûr Rûzwelt, wezîrê Brîtanya Mezin Mr. Çorçil û Mareşal Çang keyçek di Efrîqa Bakurî de civanek danîne,

Têle bowerkirin ko bi hazirîya Mareşal Stalîn li Iranê civanekî din çibibe.

LONDRE — Refên brîtanî û emirîkanî dinav 11 mehên vê salê de125 hezar ton bombe avêtine Germanistanê.

www.arsivakurd.org

# DEMA NIHA

## ROZWELT-ÇORÇIL-STALIN

### HER SÊ MIROVDEWLETAN LI TEHRANÊ CIVANAK DANÎN

MOSKÛ— Radyoa Moskovayê dide zanîn; Berî çend rojan Mr. Rûzwelt, Stalîn û Çorçil di Tehranê de civanek danîn, nimînei deyên eskerî û diplomasî ketine vî civanî. Di vî civanî de qala şerê zidê elemana û pirsên siyasî hatine kirin. Qerarên ko hatine dayîn piştre dêbêne belav kirin.

## ORDIYA BRITANI

### 8 XETÊN ELEMANA ŞKÊNANDINE

CEZAYIR— Ordiya brîtanî heşt piştî du şerên xurt û xwîndar zora elemana biriye, 3 bajar vegirtine û ber bi bakurî ve pêş ve [illegible]

LONDRE— Di ser Şerburgê re refên brîtanî 10 balafirên dijmina xira kirin.

LONDRE— Wezîrê nazî ê propagandan Dr. Gobels di kovara elemanî das Reyix de dinivîse: di şerekî de jor û jêr hene, demên çak û neçak. Lê miletê ko aleke spî ne xistiye berika xwe tu car pê emel nake. Tiştê ko divê emê bêjin ev e: em xwe tucaran navêjin bextê dijminên xwe.

## BENDA M. SUMNER WELLES

### Bi Tevkariya Hemî Miletên Hevalbend

WEŞINGTON— Mr. Sumner Welles yê ko berî wextekî cihgirtinê Wezîrê emerîkanî ê dervekariyê bû, li ser bi dervehiştina Frensê û hin miletên din ji Civanên Dewletên Mezin bendek nivîsandiye, benda ko di 30 rojnameyên emerîkanî de hatiye çapkirin. Ew têde dibêje: Miletên din ditirsin ko Brîtanya Mezin, Emerîka û Rûsya ji xwe re wê bikin adet û karên cihanê bê pirskirina fikra miletên din pêk bînin û rojekê ew miletên civanketî bibînin ko li ser hin tiştan qerarine welî hatine dayîn ko li gora wan ne bikêrî danîna silh û aştiya dinyayê ên. Divê bête hêvî kirin ko di civanê Serekdewletên Rûsye, Brîtanya Mezin, Emerîka û Çînê de li ser vê pirsê qerarek wê bête dayîn û hemî miletên Hevalbend wê bizanin ko di pirsa danîna silh û aştiya cihanê di dengê wan jî dêbête bihistin. Ma rast e mirov bawer bike ko miletê Frensiz û miletên din yên erdên vegirtî, ko roja serbestkirina welatê wan hat û ew bûn xwediyê hikim bê dev vekirin bi qerarên ko bê haziriya wan hatine dayîn û bi pêşî, rahetî û heq û hikimraniya wan girêdayî ne qîma xwe bînin û bêjin erê. Mr. Sumner Welles dawiya benda xwe de qerarên girane ko her çar Dewletên Mezin bi serê xwe distînin neçak dibîne û protestan dike.

LONDRE — Nûçegihayê ejensa Roylerî ji Lizbonê dide zanîn; Xelk zehf qala peyivên ko li ser qedandina şerî çêbûne dikin û dibêjin ko wezîrê elemanî ê dervekariyê von Ribentrop dû cara hatiye payetextê Portixalê.

Li Portixalê têtê bawer kirin rewişa şerî pêş çavan dike ko wextê danîna Ewripaye nû, gelek nîzing bûye.

## DÊRAN

Dêran.. dêranî..
Ez dêrana siwarê Xemlo me
Kejikê wêran ketim ber bi bayê
Ez bala xwe didimê, sê siwar jêr de tên xuya yê
Ez bala xwe didimê wan siwara ye
Siwarê pêşî, jê re dibêjin Riza ye
Ê bi dû de Eshedê bira ye
Ê taliyê qerecizmake reş li piya ye
Û qapûtekî reş li mila ye.
Riza ban dikirê digot: Eshed bira
Tengala vê kozikê bermede
Mêrê mêrxas be, tembiya min li te be
Xwe me de li ser kozika Gêrê
Tê de hene, gawirê şefqe kirî
Û hirçê bi birîn.
Mêrê çê be, emê hilînin heyfa
Ekremê birayê...
Emê herin Wefayê
Emê çi bidin cewaba apê xwe
vî Mistefayê...
Keko, wê êlê ji hev belav bê;
Êl bê sermiyantî na bê.
Ez bi Kejikê wêran ketim bi genek e;
Şade şihûdê mala kêfir gelek hene
Dakevin meydanê
Siwar bi siwar, lek bi lekê.
Riza bi sê denga ban dikirê
Eshed kekê,
Tenbiya min li te bê, xwe me de ser kozika Gêrê
Têde heye, peranê şefqekîrî
Hriçê bi birîn.

## Qewilê Mala Bûbê

Eman yar û meded
Ya Geylanî !...
Hewar dikim tu deyin
na kî,
Qedrê Mihemed Mistefa kî,
Eman yar û meded
ya Geylanî !...
Sê siwar hatin; min
pirsî:
Ev siwar ji mala
kê ne
Her sê siwar ji mala
Bûbê ne.
Siwarê pêşî Sîno Seydoş e
Siwarê navê Mehê Lawîn e
Siwarê talî seyid Refahî ye.
Eman yar û meded
ya Geylanî.
Ez derwêş im, derwêşkî
dîn im.
Ez ewladê Bûbû Sîn im,
Eman kalo, ez derwêşê
te me,
Heya tu sax bî ez
mirîdê te me,
Ez li ser bext û toba
şêxê xwe me.
Eman kalo, sê sîwar hatin
Min li van siwara pirsî:
Her sê siwar ji mala
kê ne ?
Her sê siwar ricalê xeybê ne.
Ser rimê van siwara
li herşê Xwedê ne
Kunrimê van siwara
Li tebekê erdê ne.
Şûrê van siwara safî
ji berqê ne.
Libsê van siwara safî
ji nûrê ne,
Eman, yar û meded
ya Geylanî !...
Ewladê Mala Bûbê zor
qehirîn !....

# MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WÊNEYÊN ŞER Û AŞTIYÊ

## Xebat - Fidakarî - Serfirazî - erdestî



Eniya Talyanê: Piştî Agirên Topên Brîtanî ê Xurt Zora Dijmina Hatiye Birin û Li Her Derê Yekîneyên Ordiya Heşt Pêş Ve Ketine.



Civatmiletê Brîtanî, Avahîyeke Kubar û Bi Heybet.



Zirehpûşên Brîtanî: Stola Brîtanî Behra Spî Ji Dijmina Paqij Kiriye û Niho Çeper û Penahên Elemana Yên Peravên Italyayê Dide Ber Gullan.

IMPRIMERIE DU JOURNAL LE MIR ORIENT

www.marsivakurd.org

1ère ANNÉE — LUNDI 6 DÉCEMBRE 1943 — NUMÉRO 30

# LE JOUR NOUVEAU

Direction: Beyrouth Wakfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR Dr. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Stg.

## Vers la Victoire

### CHRONIQUE HEBDOMADAIRE DE LA GUERRE

*En Italie, l'offensive de la 8ème Armée du Général Montgomery sur le Sangro a pleinement réussi. Elle a été conçue à l'image du plan d'attaque lancée contre les troupes de Rommel à El-Alamein: la 8me Armée a défoncé et percé la ligne d'hiver des Allemands et, après avoir établi deux têtes de pont sur le Sangro qui ont été réunies en une seule, elle a coupé les communications des Allemands avec l'Est, par la prise de Lanciano.*

*Les troupes anglaises et américaines retiennent en Italie des forces allemandes dont le Haut Commandement de la Wehrmacht aurait bien besoin pour le front oriental. Car sur ce front, les Allemands font preuve d'une économie dans leurs attaques qui est contraire à leur tactique habituelle. On s'en est aperçu dans leurs offensives en direction de Jitomir et de Korosten, dont Berlin avoue qu'elles avaient des objectifs très limités. A droite et à gauche du saillant de Kiev, les Russes poursuivent leur avance: entre le Pripet et la Bérézina, l'Armée Rouge menace Mozir de trois côtés à la fois. Plus au Nord, elle s'approche de Zlobine. Au Sud-Ouest de Krementchoug, la pression soviétique sur Znamenska se fait deplus en plus forte. Bref, les sacrifices allemands n'arrivent même pas à enrayer le rythme de l'avance russe.*

*C'est ce que vient d'avouer le Général Dietmar déclarant à Radio-Berlin: «Sur le front oriental, la décision est en balance, les offensives soviétiques se succédant continuellement, grâce à l'énorme supériorité numérique des Russes.»*

*Et la tristesse qui doit s'emparer des Allemands en écoutant de telles paroles échappées à l'un de leurs plus fameux stratèges, doit encore aggraver leur démoralisation après les terribles raids des bombardiers alliés contre Berlin—la capitale non seulement de l'Allemagne mais de tout le réseau d'organisation et d'exploitation germanique en Europe.*

*Comme chaque fois que la machine de guerre nazie subit des coups sévères, le gouvernement hitlérien réagit en lançant une nouvelle offensive... de paix. La dernière en date, qui a pour sujet la visite de von Papen au Saint-Père, vient donc à son heure: c'est sans doute le dernier argument d'une clique régnante aux abois, désireuse malgré tout de rassurer son peuple. Qu'espèrent-ils, ces stratèges qui voient se retourner contre eux la doctrine «100 o/o allemande» de la guerre totale. Ni plus ni moins que d'aboutir à une paix de compromis, au lieu de la reddition inconditionnelle du Reich exigée par les gouvernements alliés.*

## LA NOUVELLE ORIENTATION DE LA POLITIQUE SLAVE

Par **EDVARD BENÈS**
Président de la République Tchécoslovaque

*Le problème des nations slaves a toujours été inséparablement lié avec la lutte pour la liberté du peuple slave, c'est-à-dire des couches les plus vastes de toutes les nations slaves, dont les unes souffraient de la tyrannie et de la réaction intérieures (Russie, Bulgarie), les autres de la tyrannie et de la réaction étrangères (les Polonais, les Yougoslaves) et quelques-unes même des deux à la fois les Polonais, les Tchécoslovaques). La solidarité slave pouvait toujours se réduire à la seule solidarité dans la lutte révolutionnaire contre toutes les tyrannies et contre toutes les réactions. Toutes les nations slaves ont un caractère extrêmement démocratique et on trouve chez elles, de nature, des penchants égalitaires plus accentués que chez tous les autres peuples européens. La première guerre mondiale a, à un degré considérable, altéré et amélioré l'état antérieur du servage et de la non-liberté des Etats et des peuples slaves;* la deuxième guerre mondiale simplifie énormément tout le problème slave et le rapproche sans doute d'une façon inattendue vers sa solution définitive.

*Les peuples slaves sortiront de ce conflit à nouveau libres,* maîtres de leur propres Etats. *Aujourd'hui déjà, ils se sont tous rangés, la Bulgarie exceptée, dans un même camp allié, que le peuple Bulgare ralliera surement aussi, après la chute de l'Allemagne. Si toutes ces nations instauraient après cette guerre de véritables régimes populaires et démocratiques, en déduisant toutes les conséquences afférentes aux luttes menées autour de la réaction fasciste chez elles-mêmes et chez les Allemands, si elles, décidaient de résoudre, d'une manière suffisamment radicale, leurs problèmes intérieurs politiques, sociaux et économiques, elles se rapprocheraient l'une de l'autre dans une telle mesure, que même les conflits internationaux qui pourraient surgir entre elles pourront avoir une solution facile sans tenir compte des ressentiments d'autrefois sans égard au prestige national et aux ambitions nationales mutuelles et sans prendre en considération les anciennes rivalités nationales. De ce fait, elles demeureront automatiquement, après la guerre, dans une ligne internationale solidaire. Car le problème de chaque nation slave a toujours constitué le problème de chacun de ses citoyens qui ne souhaitant rien d'autre que de résoudre d'abord d'une manière démocratique toutes leurs difficultés intérieures, et de vivre ensuite en paix, en collaboration et en amitié avant tout avec les autres nations slaves.* Ce qui ne signifie pas que les Etats et les Nations slaves *perdraient leur caractère d'Etats indépendants* ou qu'ils devraient en quelque sorte fusionner ensemble en vue de former un bloc unique. Au contraire, chacune de ces nations et chacun de ces Etats doit et peut vivre, même à l'avenir, sa vie indépendante, avec ses institutions démocratiques propres.

*Si un peuple slave quelconque voulait réclamer sa liberté, son devoir moral l'obligeait à commencer d'abord chez lui-même à délivrer le simple ouvrier, le simple paysan, le simple intellectuel qui souffraient. Masaryk disait avec raison que le problème national tchèque est avant tout un problème social, ce qui peut s'appliquer à tous les peuples slaves. A proprement parler, cela constituait généralement la substance du soi-disant problème slave en Europe. C'est pourquoi je dis que dans le passé une véritable solidarité des peuples slaves n'était et ne devait jamais être qu'une solidarité révolutionnaire. La liberté des peuples slaves ne pouvait être réalisée et assurée que sur le fondement populaire révolutionnaire le plus vaste, et c'est justement pour cela que dans cette deuxième guerre mondiale, nous sommes si près de cette libération. Ce qui nous a rapprochés de cette délivrance finale des peuples slaves, c'était la lutte commune, à la vie ou à la mort, la lutte contre le fascisme et le nazisme tant international qu'intérieur, la lutte contre la plus grande réaction qui soit, du point de vue de la politique intérieure et étrangère, jamais apparue dans l'histoire moderne de l'Europe et qui s'efforce délibérément, d'une façon intérieure et internationale, à détruire à la fois et même temps la liberté et l'existence de toutes les nations slaves.*

---

*Mais si les ennemis et leurs satellites avaient gardé encore un vestige d'espoir de voir se réaliser cette paix honteuse, ils ne pouvait le baser que sur d'éventuelles divergences entre les Nations Unies. Certains événements tout récents ont pu faire miroiter aux yeux de l'adversaire, l'illusion d'un tel désaccord.*

*Il est d'autant plus heureux qu'une information sensationnelle vienne crever cette ultime bouée de sauvetage «Made in Germany». Nous venons en effet, d'apprendre que Roosevelt, Churchill et Chiang Kai-chek viennent de se réunir pour poser les derniers jalons d'une stratégie commune contre le bout japonais de l'Axe. Quant à l'autre bout, celui qui se trouve en Allemagne, durement ébranlé sous les coups de défaites à l'Est et de bombardements en Europe, une autre Conférence est sur le point de l'écraser définitivement.*

*Leurs pourparlers avec le chef de la Chine terminés, le Premier britannique et le Président des Etats Unis se sont rendus à une destination inconnue, pour y rencontrer le Maréchal Staline. Cette entrevue à trois, dont nous parlent à mots couverts toutes les radios du monde, est sans contredit, l'événement décisif de cette guerre.*

*De quoi s'agit-il?*

*Il s'agit, dans l'esprit des trois hommes d'état et de tous les hommes libres du monde - et enfin, et surtout, dans l'esprit de tous ceux qui attendent leur libération d'une conversation qui doit établir, non seulement le détail des opérations coordonnées qui arracheront la victoire, mais encore les conditions de la Paix qui lui succédera.*

*Depuis trente ans, l'Europe et le monde sont déchirées par les combats successifs qui sont comme les chainons d'une seule et interminable guerre.*

*Pour assurer aux peuples torturés, une paix juste et humaine, il faut qu'après cette victoire, les combattants ne se séparent plus, comme ils avaient fait, hélas, en 1918. Pour ne pas perdre la paix après avoir gagné la guerre, les Nations Unies doivent rester unies.*

*C'est là le principal objet, sans doute, des entretiens qui se passent en ce moment, quelque part dans le monde, entre les trois Chefs alliés.*

L. V.

## LES GRANDS KURDES DE L'HISTOIRE

### LA DYNASTIE DES AYOUBITES (1169 — 1260)

L'atabeg turc Nour ed Din avait fondé, après l'échec de la deuxième Croisade, un royaume turco-arabe qui embrassait toute la Syrie musulmane. En 1164, en 1167 et en 1169 il envoya son meilleur général, le vieil émir kurde Chirkouh, en Egypte, pour intervenir dans les affaires du dernier khalife fatimite. Le 18 janvier 1169, le neveu de Chirkouh, Salah ed Din (que les Croisés appèleront Saladin), se rend maître de la personne du vizir égyptien, Chawer. Chirkouh s'installe à sa place, mais meurt deux mois plus tard; Saladin lui succède dans les fonctions de vizir.

En 1171, Saladin supprime le khalifat fatimite du Caire, rétablissant ainsi l'unité de l'Islam sunnite. En [illegible] à la mort de Nour ed Din, Saladin marche sur Damas. Sans rencontrer de résistance, il ajoute à ses possessions d'Egypte tout l'Héritage de Nour ed Din, à l'exception d'Alep, qu'il conquiert en 1183.

Saladin a réuni sous son autorité la Syrie et l'Egypte, plaçant ainsi les conquêtes des Croisés en face d'un danger auquel elles succomberont. Le coup final a été porté par les sauvages Mamelouks, mais l'essentiel de la tâche a été accompli par Saladin et par sa dynastie, les Ayoubites, au cours de luttes où les négociations ont eu autant de part que les combats guerriers. La lutte des Ayoubites a été une lutte courtoise, pendant laquelle les mondes chrétien et musulman ont exercé l'un sur l'autre une action dont les effets sont décisifs dans l'histoire de la civilisation.

Le genie politique de Saladin a uni le monde musulman contre les Croisés. La prise de Jérusalem et ses batailles contre les Francs témoignent de son génie militaire. Mais la plus grande gloire de la dynastie ayoubite reste celle d'avoir produit des hommes chez qui la générosité, l'humanité, le sentiment de l'honneur sont uniques dans l'histoire de l'époque.

Voici quelques épisodes qui illustrent les qualités humaines des grands Ayoubites:

A la prise de Jérusalem (1187), Saladin empêche que toute violence ne soit commise à l'égard des Chrétiens. Malgré les demandes des fanatiques, il refuse de détruire le St. Sépulcre. Une rançon avait été fixée pour la libération des Chrétiens de la ville. Les Templiers et les Hospitaliers s'étaient refusés à fournir toute la somme nécessaire; sur la demande du patriarche, Saladin donna la liberté à 500 Chrétiens pauvres. Son frère Adil s'en fit adjuger 1000 autres, qu'il libéra. Saladin combla de présents les veuves et les filles de Chevaliers tombés à la guerre. Il fit conduire une partie des réfugiés aux villes franques de la côte (Tyr et Tripoli) et une autre partie à Alexandrie où, avant de les renvoyer en Europe, il les hospitalisa tout l'hiver.

*(a suivre)*

## LA PRESSE KURDE

*Nous signalons, à nos lecteurs s'intéressant au mouvement culturel KURDE, les journaux et périodiques kurdes suivants:*

**RIYA TAZÉ.** organe des Kurdes de l'U.R.S.S paraissant à Erivan.

**GALAWÉJ.** la plus grande revue littéraire kurde, parait chaque mois à Bagdad, avec 80 à 100 pages de texte

**JIYAN** hebdomadaire politique et littéraire, paraissant à Souleymanié.

**HAWAR,** revue littéraire bi-mensuelle paraissant à Damas. Textes kurdes et français.

**RONAH** Revue mensuelle illustré, paraissant Damas.

Strana Kurdî

# DELALÊ QEREJ-DAXÊ

Were delal, mi li diyara diyarê selwîne.

Tavek ketiye li Qerejdaxa şewitî, qûlê babê Mam dela rengîn e.

Tîrêjkê xwe, berdaye welatê Boz—Hewayê, welatê culêb berya Bavê Bozîn e, qasidê xelkê Rewî û êlçî ne;

Qasidê min û xelkê delal çelê mubareka havînê pirîzkê berfê peşkê baranê helkanê Bayê Xerbî ne.

Xwedê o miradê ne ji dil be, bira ji axa gora re bimîne.

Were delal lawiko çiya sar e ji berfê ra, zozan xweş e ji kêfê ra Qerej dax xweş e koçeryê ra.

Xwedêwo, miradê ne ji dil be, bira bimîne, ji axa gorê ra

Xwedêwo berya jêrîn nav rûyê da, eşra rast e ji nigê xam ciwaniya delêl ra.

Mi li diyara li diyarê xana xerêb e, tavek hilkişyaye berya Boz—Hewayê, xwe berda berya culêb e.

Ecêba mezin ew ecêb e, çawa dergistiya mere Heft sala be

Sala Heşta çawa bermalya mala xelkê be.

Were delal, min û li diyara li diyarê Mêrgemêr ê pezê lawikê mi na xwe, pelê melwendê koka ta'li şîrê, ez bi qurbana tilyê delalê dilê xwe bim, qerimî ser darê bulurê.

Hey lo delal, di ser me ra çiya ye, di binyê me ra pozê cûrê, pozê Tugêl û Xwêr û Yarimce giş xuyaye.

Taximê sing û berê mi keçikê, ji delalê dilê mi ro, nala purtuqa lekê ji purtuqalê Yafayê, hungûvê Sêrtê, xurmake Bexdayê, Hejîrke şingalya ye.

Na welle taximê sing û Berê mi keçikê, ji delalê dilê mi ra; nala mewîjê Hebabê, dimsa Tizyanê guşyak tiryê lawê qoc e, cubûr li Diyarbekra şewitî, di sundaqa da bi ser hevda mêw şirêz daye.

Were delal hatiye mala sêvê zere alemê kirî, bi weqyan, mi ji delalê xwe re kirî rûn ber bere.

Xeberek ji mi ra hatî dibê delalê dilê ne xweş e, melle li ser e. Mi go rebî ta delêl be, mirina wî be, ruhê mi tê keve bere.

Were delal, mala me vaya ye, çira me sêketî, agirê me dadayê, birayê mi biçûk e li mekteba ye.

Yextiyarê bavê me, li oda yê, pîrek diya me heye, ji êvar da lihef di serê xwe wer daye.

Delal were taximê sing û berê mi keçikê, ji te ra muxella maye.

Were lawiko, li Qerej daxa xopan, li hûr guniya, li pozê Mamdelê, li berazîya şewitî li kuran û kopan, li daran û li deviya, ezê çûme Mêrgemîra şewitî berfê barî bi kulîya.

Were delal, bira li me hilnehata sitêrka ber qurûxê, bira şewqê xwe da li pozê Deveqirana, kura tewşalixê, ez mêvanê 33-ê biskê ta zerî yim, xwe berdaye ser guruki gerdanlixê.

Were delal, bela ez û tu ne qeda, ez û tu ne em bûna, heşa Helebê, qîra Bexdayê ardê, cêhin, li rûyê cuwanik û cuwamêrê xelkê ketine.

Were, destê xwe di nav bêna destê mi ke, emê hev du birevînin, tim û tim biçin, emê xwe berdin welatê Enadolê, beriya Qonyayê curm û cewaba, welatê xerîb li ser min e.

Belkî xelkê xerîb bibêjin: hon ji ku da tên, ku da diherin.

Ezê bibêjim em her du, bi hev ra xweh û birê hev û du nin, bavê me yek e, dayîkên me du nin.

Zemanekî xerab rabûye, qanûn ke ne baş hatîye danîn, em ji ber zilm û mezalima Mustefa Kemal paşa direvin.

Gelek ehmeq li dinyayê hene ewê bibêjin qey rast e, bi hev ra vana; xweh û birayên hev û du nin.

Lawê bava, gelek ciwamêrê a qildar li dinyayê hene,

Ewê bibêjin na welle; vana qîz û xort in, xwîna wan kelyane, milyaketê wan li ezmana, ji hev du hez kirine, bi destê hev girtine, bi welatê xerîb û xurbetê da, hev du revandine.

Ewê bibêjin kerem kin, heqê mehra we li ser min e.

Wey lo delal, wey lolo delal, Mêrgemîra şewitî bilind e, kula dilê mi li ask e,

Tu were destê xwe di nav bêna destê mi ra derbas ke.

Emê hev du birevînin, welatê Boz—Hewayê; topraxa qoce Ûrfayê.

Kelek û gemiyê welatê Bêlacûkê, xazî Entaba mubarek pêda, pêda derbas ke;

Emê di welatê xerîb û xurbetê kevin, şîva xwe nîvê şeva ji xwe ra pars kin, emê li nabêna xwe dînin emê şukir, şukir bikin, em xerîb in, xerîb gêtin, welatê me dûr e, kesek me nas na ke.

Were delal, bira ne hata bîna bayê her dû Cizîra

Bira ne xista li beraziya xopan li Qerej—daxa şewitî, li pozê Mam delê, kula dilê mi li nabêna her dû Mêrgemîra.

Tu were destê xwe di nabêna destê mi ke, emê hev du birevînin, xwe berdin welatê xerîb û xurbetê,

Şama şerîf, Heleba mîra, de bira aza û mûxtarê vî zemanî, ne rîn ser cila bavê te rûnenin, te ji mi ra ji bavê te nexwazin bi hukmê rişwet û bertîla.

Were lawiko, baran barî lîre lîr e; li Qerej—daxa şewitî li Mamdela xopan giha rabû, bû qesîle.

Were destê xwe di nabêna destê mi ke,

Emê hev du birevînin, mi bavî paş Evdulqadir Qedûr Rail Elya, exû zergû, wê dawa min û bejna zirav delalê malê çêkê bê bertîl e.

Were delal, li min û li diyara, li diyarê Herzêlê çerçî û etar kişyane nava êlê.

Xelkê ji delalê xwe ra kirî kil û neynik, mi ji delalê dilê xwe ra kirî çefiya bin egêl e.

Were delal, hatiye mala etarê Darê, xelk û alem kişyane ser bazarê. Xelkê ji delalê dilê xwe ra kirî bû, kil û neynik, mi ji delalê dilê xwe ra kirî bû, derbê mîrata enextarê.

Were delal, li Qerej—Daxa şewitî li giran û gir mitika, kula dilê mi welatê Boz Hewayê, beriya culêb, delavê qazan û qitika, xelk mêvanê malan û miha.

Ez dizê şeva, nîvê şevê mevanê Himêza mezin, 33-ê biskê zerî, qawanê çavê reş û belek, deqê bin boxazê, taximê sing û beran, mubarekê cotê memika.

Were delal, zozan e, xweş zozan e, Qerej—Daxa şewitî ciy û meqamê ava cemidî, kula dilê mi Kanî û mêrgan e; de kula dilê mi kekê sarê segmanê enexdarê rêfsê xortan e.

Were delal, bê bexto bi te ra geriyam salekê sal wext o, dilê xelkê ket mal û dewlelê, dilê mi ket Bejna t'a zirav girêdana rexta..

Were delal, Mamdel e, xweş Mamdel e, kevrê serî daîm belle mal cîran e, pez hevgel e.

Were delal dilê mi tike, tike; kenê bavê Nezîr hûr bizmik e.

Tu were destê xwe di nabêna destê mi ke; emê hev du birevînin, bavî paş Evdulqadir Rail Elya Xeyalil-ubeyye, lawika beranê çar gurçik e.

«ne qe tiyaye»

EBDILHADÎ MIHEMED

# PÊJINÊN DINYAYÊ

## CENG & BIHINGEH



Eleman Dib'in me Kelata Ewripayê Bi Top û Şargehan Kiriye Asêgeheke qaim.



Lê Belê Tangên Hevalbendan Ên Dêwbejin Dergehên Vê Asêgehê Dişkînin û Pêş Ve Dikevin



ÇOYEK JI YÊN KANIYÊN GAZÊ.

www.arsivakurdi.org